# Sozdariya li Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad a Komara Federal a Almanyayê

Ji bo daxwaza Destûra Mayînê (Îqamet) li gorî Beşa 104c, Paragrafa 1, Hevoka 1, Hejmara 1 ji Aufenthaltsgesetz (AufenthG – Qanûna Mayînê, Çalakiya Aborî û Entegrasyona Welatiyên Derveyî di Qanûna Mayînê ya Herêma Federal da)

1) Ez sozdarê Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad a Komara Federal a Almanyayê me .Bi taybet ez babetên xwarê piştrast dikim:
   a) Mafê gel ê sepandina desthilata dewletê heye
      - Di hilbijartin û dengwergirtinê da
      - ji aliyê saziyên qanûndarêştin, cihanîn û dadweriyê va.

      Gel nûnerên welatiyan bi dengê cîhanî, rasterast, azad, yeksan û nihênî dibijêrin .
   b) Saziya Qanûndarêştinê pabendî Qanûna Bingehîn e .Saziya Cihanînê û Saziya Dadweriyê sozdarê qanûn û dadmendiyê ne.
   c) Opozîsyona parlemanî dibe ku were pêkhatin û sepandin.
   d) Hikûmet divê bersivdarê kiryarên xwe li pêşberî nûnerên gel be .Hikûmet dikare bi dengdanê bikeve û were guhertin.
   e) Dadgeh serbixwe ne.
   f) Her cûre desthilata bi zorê an jî desthilata keyfî tê redkirin.
   g) Mafên mirovan ji binpêkirinê tên parastin.
   h) Qanûna Bingehîn rûmet û wekheviya hemî mirovan misoger dike .Kiryara ku bi dû armancên dije-cihûyî, nijadperestane, biyanî-fobiya an armancên din ên nemirovî be, ne li gorî vê yekê ye û li dijî vê daxuyaniyê ye.

2) Ez radigihînim ku ti yek ji hewldanên xwarê naşopînim an pişta wan nagirim û min di raboriyê da jî wisa nekiriye:
   a) hewldanên ku li dijî Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad, hebûn an ewlehiya federasyon an dewleteke ne, an jî
   b) ku bi armanca gihandina zirar û ziyana neqanûnî li xebata fermî ya saziyên bingehîn ên federasyonê an eyaletekê an jî endamên wan bin, an jî
   c) ku berjewendiyên derveyî yên Komara Federal a Almanyayê bi rêya bikaranîna dasepandina zorê an jî kiryarên seretayî bo vê mebestê tûşî metirsiyê tîne, an jî
   d) armanca wê kiryareke dijî cihûyan, nijadperestane, biyanî-fobiya an kiryarên din ên dije-mirovî be.

3) Min ‘Belgeya Zanyariyan a derbarê Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad’ de wergirtiye, xwendiye û tê gihîştime.

__________________________________________

____________________________________________

Cih û roj                                        Wajo